# Efrîn di bin dagîrkeriyê de (290):

**"Haron Reşîd" û endamên wî dijatiyê li ser sivîline Kurd dikin, gotara kîndarî û zikreşiyê li dijî karmendine Kurd û nerazîbûna valakirina malên ku dadgehê biryar pê derxistine ku li xwediyan bêne vegerandin, du gundên niştecîkirinê û yek jê jî bi perên komeleyeke "Birêtanî", girtinine bêsûcane û geregoşiya bikaranîna çekan**









Danûstandina bi Kurdan - xelkê herêmê re, ji berî û piştî dagîrkeriyê, li ser bingeha kîn û kîndariyê û di bin siloganên "şoreşgeriyê û cîhadê" de -yên dûrî berjewendiyên Gelê Sûriyê û tenê dikevin xizmet siyasetên Turkiyê yên dijayetî û armancên wê yên dûr û dirêj- hatiye avakirin, yanê yaxmekirina jiyan û malmewdanên wan; Û tonbiton rêxistinên Islama siyasî -çi yên sivîl û leşkerî û bi ser de jî Milîseyên Sûrî yên nandoz û çarçewin siyasî yen rikber- şimitîne vê pêlan û siyasetê, û nemaze ku bi dehan rikxirawên Islamî yên di bin navine mirovî û fîxanî de li "Turkiyê û Qeterê û Kiwêtê û Isra'îl(Erebên 48 an) û Bakistanê û Birêtaniya û Almaniya... û yên din" rêdankirî/ruxsetkirî peran didin û alîkariyê di avakirina gundine niştecîkirinê de li Herêma Efrînê dikin, ji bo niştecîkirina anîndeyan, û dawiya dawî guhertina endeza demografî li gor pilana ku Anqerê daniye û bi rêkûpêk serpereştiya cîbicîkirina wê dike.

**Ev jî hin bûyînên li ser rewşên serwerkirî ne:**

**= Dijatiya li ser sivîline Kurd:**

"**Ehmed Şehûd Reşîd/Haron Resîd**" cîgir û xwarziyê serkêşê Milîseyên "Tîpa Nehan/El'firqe El'tasî'e" û hin endamên wî "**Ebo Heyat, Ehmed Ebo El'nof, Yûsêf Mi'êkî, Emar Mi'êkî, Yasêr Mi'êkî**" li Navça Reco -bi sixêf û lêdana mekin- dijatiya sivîline Kurd dikin, jê:

- Ji berî bêtirî heyvekê ve, li ser xort "**Şêro Selah Osman Mistefa** /23/ sal" ji xelkê Gundê "Maseka", li cîgeha Çateriya "Batmanê" li Seberjêriya "Ermûtê/Riya Reco" - Meydanekbezê, ji ber ku wî silav li "Haron Reşîd" nekir û bi zarzimanekî ziya lê vegerand, li dema derbasbûna "Haron" di kolana mala wî re li gund; Û gefdana kuştinê da wî, eger ew li ba aliyekî gilî bike.

- Li 23.05.2024an. Z, birayê "Şêro" yê xort "**Ciwan** /25/sal" hate dûdankirin, li dema ajotina wî ji zeviyeke zeytûna re bi tirektorê - li nêzîk derbasgeha Bajaroka Reco ya Bakur, û ji ber wê ew revî cem rêbenda ewlehiya hevbeş a Milîseyên "Asayêşa Leşkerî û Asayêşa Sivîl li Reco", lê endamên rêbendê -piraniya wan ji Tipa Nehan e- tevî yê dûdan dikir dijatiya wî û bavê wî -yê ku di heman demê de di rêbendê re derbas dibûkirin û ew revandin, ta ku ew bi şev di rewşeke xerab de -ji ber işkencekirina mekin- berdan; Tev jî ji ber ku bavê herdu xortan "**Selah Osman Mistefa** /50/sal" daxwaza wan -peydakirina sîtêrek avê- bi cih naniye, bi sedema mijûlbûna wî bi karên xwe.

**-** Li 23.05.2024an. Z, li ser Hemwelatî "**Mihemed Hisên Hebeş** /45/sal - bi **Muhemedê Mîrê** tê navdan" ji xelkê Gundê "Kûra", li nêzîk çateriya Gundê "Maseka" - Bakurî Bajaroka Reco, ji ber ku daxwaza wan -peydakirina sîtêreke avê- bi cih naniye, bi sedema mijûlbûna wî bi ajotina erdan.

Ji Milîseyên "Tîpa Nehan" re normal bûye ku xwediyên tirektoran ên Kurd li gundên di bin desteseriya wan de neçar bikin ku sîtêrên avê bê kirê ji wan re wînin, û herweha jî bê dandina nirxê avê ji xwediyên bîran re.

Û ji ber ku endamên "Firqê" di nav Milîseyên "Asayêşa Leşkerî li Reco" de pir in, vêca herderin binpêkirinan di dermafê Hemwelatiyên Kurd de pirtir dikin.

**= Nerazîbûna valakirina malên Kurdan li Efrînê:**

Di navboriya hefta borî de, li hin ciyan (mizgeft, li pêş qesra dadê, Gergeha Newrozê) hin kombûn ji aliyê anîndeyên (ku dest danîne ser malên nişteyên Kurd ên resen li Bajarê Efrînê ji wexta dagîrkirina wê ve sala 2018an. Z) derketin, piraniya wan jî ji "Xota - Gundewarê Şamê" ne, û ew liv û tevger bi riya hin perçevîdiyo û dengên belavkirî di toreya hevgîhana civakî de hatin belgekirin, û tê de ew nerazîbûna xwe diyar dikin, ji valakirina malên ku dadgeha dagîrkeriyê li Efrînê pê biryar daye ku wan radestî xwediyan bike, yên ku piraniya wan jî ji penaberî û koçberiya zorane vegeriyane; Û yên pişikdar di wan kombûnan de bi derewîn dibêjin ku dadvana Kurd "**Newroz Hiso**" biryarin "zordar" bi valakirina /150/malî derxistine, û "**Mihemed Şêx Reşîd**" ê Kurd - cîgirê serokê "Encûmena Xwecihî li Efrînê" jî di ber de berpirsiyar dibînin, û herdiwan bi nûkeriyê ji Partiya Karkirên Kurdistanê(PKK) re tewanbar dikin, û ji ber wê qîreqîr û siloganên wan -di nav gotina Elah û Ekber de- bi nijadperestî û hurhutandinî li dijî jinê û Kurdan hatin avêtin, û weha jî gotara kîndarî û gefdanê ya ku ji rûmeta herdiwan dadixîne û doza yaldankirin û qewtandina wan dike, li kêlekê jî salixdana wan bi xeysetên nesinciyane, bi ser ku ew herdu di nav saziyên Dagîrkeriya Turkiyê yên çêkirî de -ji sala 2018an. Z ve- kar dikin, û "Newroz Hiso" di nav govdeyeke dadwerî de dadvanê niyabê ye, ye ku Istîxbaratên Turkiyê serpereştiya wê dike, û biryar tê de ji aliyê dadvanin -piraniya wan Erebên anînde ne- ve têne standin, û Newroz ne dadvana dawîkirina dozan û derxistina sezayan e; Û kombûna yekê di mizgefteke bajêr de bû, li rex hildana siloganên "şoreşgerî û cîhadî" ji bo rêdana yaxmekirina malmewdanên Kurd.

Û weha jî perçedengin tekez dikin ku milîseyên hêza hevbeş a "Tîpa/Firqit El'sultan Silêman Şah, Firqit El'hemze" ji nû ve maleke bi biryareke dadwerî ji aliyê "asayêşê" ve hatiye valakirin ji xwediyan stand, û radestî malbata ku berê dest danîbû ser kir.

Were bîranîn jî ku hejmarek ji çadirgehên vala hene, ew kanin anîndeyan tê de bi cî bikin, ger ji malên Kurdan hatin derxistin, bi ser de jî piraniya yên ku dest danîne ser malan kanin kirên malên desteserkirî bidin, lê ew naxwazin û razî nabin bidin xwediyên malan ên Kurd.

Û eger yê dest daniye ser maleke Kurd di nav refên Milîseyên "Artêşa Niştîmanî ya Sûrî" de çekdar be, wê hîngê xwediyê malê ji tirsa darizandinê re nikane daxwaza valakirina mala xwe bike, yan jî ew neçar dibe ku vêrgiyeke mezin bide da ku vegerîne, û ew nikane dozekê jî li dijî wî li ba dadgeheke sivîl veke, ji ber ku ew "leşker" e, û dadgehên leşkerî jî dozên weha li ba xwe tomar nakin.

**= Du gundên niştecîkirinê:**

**-** Li 26.05.2024an. Z, "Kompaniya Welat a avakerên Endezyariyê/şerîkit Weten Lîl'înşa'at El'hendesiyê" (ya ku li herêmên dagîrkirî û di bin bandora Turkiyê de -li Bakurê Sûriyê- kar dike), li ser rûpela xwe ya Fêsbokê ragîhand, ku wê hemahema "Pirojeya avakirina du avahiyên qateyî li Bajarê Cindirêsê, ji "Rikxirawa/Komela Royê Hêviyê/Şems El'emel" re bi dawî kiriye, û her avahiyek ji "/3/ qatan, her qatek ji /8/ perçemalan/şiqeyan, û her şiqak jî ji du odan û aşxanakê û xizmetguzariyên din û rûbereke /65/M2" pêk tê; Yanê bi tevahî /48/ perçemal ji bo niştecîkirina malbatine anîndeyan, bi pereyên "**Komela Şems El'emel a mirovahî - Umut Güneşi İnsani Yardım Derneği**" ya ku "Dr. Xalêd El'mesrî" bi rêve dibe, yê ku ji nivîsgeha xwe ya li Bajarê Rîhaniyê yê Turkî ve têkildariyê bi alavên ragîhandinê re dike, bê ku navnîşanên naskirî yên komelê li ser Toreya "Nêt" û hevgîhandinên civakî hebin.

Û herdu avahî li ser erdekî çandiniyê li dor Bajarê Cindirêsê hatine avakirin, piştî ku darên zeytûnê jê hatin hilkirin.

**-** Li gor raporeke wênekirî ye Ajansa Nors-Prês, jêdereke xwecihî û rûpela Fêsbokê ya Komela "**Minara Deryayê/Menaret El'behir/Deniz Feneri**" ya Turkî ( ya ku navnîşana wê jî li "Zeytûn Borno - Istanbûl" ye, û piroseyê dide cîbicîkirinê), karên avakirina gundekî niştecîkirinê yî nimûneyî (yê ji /160/malî nişteyî digel binesaziyekê û xizmetguzariyin giştî "dibistan, dermankiringeh/mistewsef, mizgeft, gulîstan, lîstgeh..." pêk tê) li Navça Şera berdewam dikin, ji bo niştecîkirina anîndeyên ku anîne herêmê, bi navê Gundê "Yek Milet/Ume Wahîde/One Ummah", li ser navê komela ku perên pirojeyê dide; Û ew komeleyeke Birêtanî Islamî (**Yek Milet - One Ummah**) ye, û navînaşana wê jî ev e: " 202 Victoria Road , Middlesbrough, United Kingdom".

Gund li rex du gundên berê (yên bi bilok û çadiran) tê avakirin, li ser erdekî rûbera xwe dora/3/hikataran, beşek ji çend daristanên ihracê yên çandiniyê ye, yên li rex hev û bi temamî ji aliyê Milîseyên "Tîpa/Firqit El'sultan Mûrad" ve hatine qutkirin û qirkirin, li cîgeha li ser riya di navbera Gundên "Keferom, Elkê/Hilobiya biçûk" de - Navça Şera.

Were bîranîn jî ku "Mihemed Cengîz" rêvebirê rêvebiriya "Denîz Fenarî" û hejmarek ji endamên encûmena wê li 12.05.2024an. Z seredana pirojê kirin, û berê jî Komelê li 23.01.2024an. Z Gundê "Denîz Fenarî" yê niştecîkirinê û ji /200/malî pêk tê vekiribû, ê ku bi perên "Saziya Dilovanî ya Cîhanî - Global Rahmah Foundation (GRF)" a Birêtanî hatiye girtin, li cîgeha Zaretgeha "Qaziqlî" - Navça Cindirêsê.

**= Girtinine bêsûcane:**

**Destlatên Dagîrkeriyê ev girtin:**

**-** Ji sê heftan ve, Hemwelatî "**Rêzan Bozan Hesen** /20/sal" ji xelkê Gundê "Kosa" - N. Reco, ji aliyê Milîseyên "Feyleq El'şam" ve, yên ku ew radestî Milîseyên "Asayêşa Leşkerî li Reco" kiriye, da ku paşê jî bo Hepsa "Maratê" ya navendî li Bajarê Efrînê were guhestin, û ta niha bêsûcane girtiye, bê ku em zanibin tewanbarkirina/tuhmeta wî çi ye?

**-** Ji deh rojan ve, Hemwelatî "**Ebid El'rehman Resûl Ibrahîm** /30/sal" ji xelkê Gundê "Axcelê" - N. Cindirêsê, ji aliyê Istîxbaratên Turkiyê û Milîseyên "Asayêşa Sivîl li Efrînê" ve, yên bi tuhmeta xizmetguzariya neçar di Rêvebiriya Xweser a berê de ew vexwendin biryargeha xwe, û piştî çend rojan ji bendkirinê û ferzkirina baceyeke diravî /400/Dolar Emrîkî li ser ew berdan; Paşê jî li 29.05.2024an. Z li pêş "Dadgeha Efrînê" beşdar bû û careke din bi /400/Dolar hate bacekirin û paşê jî hate berdan, bi ser perîşanbûna wî de.

**-** Li 28.05.2024an. Z, Hemwelatî "**Rêzan Yûsêf kurê Hisên** /37/sal" ji xelkê Gundê "Kora" - N. Cindirêsê, piştî ku Milîseyên "Asayêşa Sivîl li Cindirêsê" ew vexwend biryargeha xwe, û ta niha li ba wan bendkiriye, bê ku were zanîn ku tewanbariya wî çi ye?

**= Geregoşî û serberdayetî:**

LI 27.05.2024an. Z, "**Hesen Cemîl El'cezar**" ji Parêzgeha "Hemê" û endam di Milîseyên "Asayêşa Leşkerî li Reco" de, du qurşîn avêtin çîpê hevalkarê xwe "**Ebo Xalêd**" ji Parêzgeha "Dêrezorê/Dêr El'zor", bi sedema nelihevkirinê li ser avêtina yê dawiyê ji gilgemara malbata xwe re...Û herdu malbatan jî dest danîne ser du malên li rex hev li Bajaroka Reco.

**Li vê dawiyê, hurhutandin ku li Bajarê Efrînê di nav komên anîndeyan de çêbûye, li dijî karmendine Kurd li ba destlatên Dagîrkeriya Turkiyê û li dijî Kurdên ku daxwaza malên xwe -yên ji bêtirî şeş salan ve desteserkirî- dikin, fîtnê çêdike û zepkirina malmewdanên Kurdan -xelkê herêmê- pir û kûr dike, û herweha jî ew ji bo rawestandina wan biryar û pêngavên hindik e, yên ji bo berjewendiya wan -mîna mafekî dadmend- û di bin fişarên raporên mafwerî û ragihandinî de derdikevin.**

01.06.2024. Z – 2636. K

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**

**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

--------------------------

**Wêne:**

- "Ehmed Şehûd Reşîd/Haron Reşîd" cîgirê serkêşê Milîseyên "Tîpa Nehan/El'firqe El'tasî'e" û hin endamên wî yên ku dijayetî li sivîline Kurd li Navça Reco kirine.
- Kombûnên anîndeyan li Bajarê Efrînê, di hefta dawiyê de ji Gulana 2024an. Z, yên ku razî nabin malên Kurdan vala bikin, ên ku dadgehê bi valakirin û radestkirina wan ji xwediyan re biryar daye.
- Gundê "Royê Hêviyê/Şemis El'emel" yê niştecîkirinê li nêzîk Bajarê Cindirêsê.
- Gundê "Yek Milet/Ume Wahîde" yê niştecîkirinê yê nimûneyî li Navça Şera.